# 5. Pêwîstiya te bi alîkariyê ye? NIHA BI MERE PÊWENDIYÊ BIGIRIN!


**IOM Rêxistina Navneteweyî ji bo Koçberiyê – Nivsîngeha li Atînayê**

6 Dodekanisou Str., Alimos, 17456, Atînayê

Telefon: +30 210 9919040

Feks : +30 210 9944074

E-mail : *iomathens@iom.int*

*www.facebook.com/pages/IOMGreece*


**Ofîsa IOM ê li cihên din ên Yewnanistanê**

**Herêma Sereke:**

**Tesalonîkî:** +30 231 3317 349, +30 694 6893 032, +30 694 9662 666,

**Patras:** +30 698 5111 206

**Korînt:** +30 697 0424 354

**Îyoanina:** +30 265 1001 025, +30 698 6547 044

**Evros:** +30 694 6840 125

**Girav:**

**Girît:** +30 698 5111 205

**Samos:** +30 697 2331 440

**Kos:** +30 694 4864 986

**Lesvos:** +30 695 8475 878

**Xiyosê:** +30 695 5466 613

**Leros:** +30 694 1580 330

International Organization for Migration (IOM)

The UN Migration Agency

# Derbareya me

Rêxistina navneteweyî ya koçberiyê (IOM) ji bo alîkarîya te amade ye. Em dikarin li Îtalyayê, Macaristanê, Avûstûryayê, Slovenya, Kroatya, û Bulgaristanê ji we re alîkarî bikin!

Agahiyên bêtir li ser me di Facebook û li malperên me de hatine pêşkêş kirin

**https://greece.iom.int/**


*Ev proje ji aliyê Yekîtiya Ewropayê va ji hêla malî hatiye dabînkirin*


*Parastina zarokan di şert û mercên qeyrana koçberî û penaberiyê li Ewropayê*

# Hello! Γεια σου! سلام!

MAF Û BERPIRSIYARIYÊN ZAROKAN




# 4. Pêvajoya penaberiyê - gav bi gave



### Ku penaber tê hesibandin?

Ji bo penaber yan zarok koçber, ji bilî mafên ku di UN CRC de hene, parastin û alîkariyên taybet, hatine berçav girtin.

**Zarokên penaber:** kesên ku jiyana wan ji ber sedemên cûda (nijad, ol, neteweyî, nêrîna siyasî, û hwd.) di xeterê de ye, mecbûrin ku dev ji welatê xwe berdin.

**Zarokên Koçber:** kesên ku bi sedemên cûda li derveyî welatê xwe ne - egerên ji bilî ji egerên tikildarî tirsa ji çewisandina ku rewşa wan diguhere rewşa penaberiyê.

**Penaxwaz:** ew kesên ku li gor qanûnên welatekî taybet, pêvajoya penaberiyê derbas dikin, da ku wek penaber bêne pejirandin, tê wateya ku ew di bin vê qanûnên de dibin xwediyê statuyeke taybet a parastinê heta dema doza wan tê lêkolîn kirin.

### Divê yekim xebata min çi be?

Paş ku hûn hatine Yewnanistanê, li pêşî de divê tu bilez daxwaza vergirtina parastina navnetewî wekî penaber, radest bikî. Mafekî bingehîn e ji bo te ku wek penaberek bê naskirin. Divê daxwaza wisa radestî Rayedarên Penaberîyê bikî. Eger malbat/xizmên te li welatên din ên endamên YE dijîn, ev giring e ku bilez vê babetê ji aliyê Rayedarên Penaberîyê re rabigehînî.

Nivsîngeha Sereke ya Xizmetên Penaberiyê, Atîka: +30 210 69 88 500, +30 210 99 03 370, +30 210 41 87 090

Hêla telefonê bi agahîyên qeyd kirî bi 10 zimanan: +30 210 69 88 660

Email: relocation@asylo.gov.gr

Email: aka.peiraia@asylo.gov.gr

**Pêngavên taybetî:**

- ✓ Serdana nêziktirîn Xizmeta Penaberan bikin. Hemû xizmet belaş in.
- ✓ Rayedarên penaberiyê tê hin pirsan li ser te ji te bipirsin ku divê bi awayek rast bersîv bide. **Ti sedem ji bo tires tune ye!**
- ✓ Kartek liser daxwazkerê parastina navnetewî tê ji te re bê (wek nasnameya te) ku nabe vê winda bikî! Vê hertim bi xwe hilgire! Hertim civîna xwe ya pêşî li gel navenda Xizmeta Penaberan bi bîr bîne û karta xwe gel xwe bibe
- ✓ Herwisa, li ser daxwaza veguhastinê jib o tevlîbûna bo malbatê, ji ji rayedaran bipirs e!

### Polîs û efserên penaberiyê tê gel min çi bikin?

Ew ji te dixwazin ku temenê xwe û nasnameya xwe ji wan re bêjî. Ser berjewendiyên te ye ku tu ji wan re rastiyê bêjî!

### Çi cûre pirs dê bêne pirsîn?

Ji bo baştir fêmkirina rewşa we, dê ew pirsên hêsan, ji bo nimûne bên pirsîn:




- ✓ Tu ji kû derê yî?
- ✓ Tu çend salî yî?
- ✓ Ji kîjan welatan derbas bûyî?
- ✓ Rêwîtîya te bi tenê bû?
- ✓ Gelo ti endamekî malbatê te li Ewropayê dijî?

Berisva pirsan herî baş bide. Eger tu nikarî bersîv bidî, wê ji me re bêje. Eger pêdivîya te bi bênvedanê hebe, dikarin daxwaza bênvedanê bikin. Gotinên te, wê di niviskî ji werin tomar kirin. Babetên qeydbûyî tenê eger hûn fêm dikin îmze bikin. Eger şaşiyek çêbe yan ji tiştek kêm be, bila rayedarên li ser wê bizanim. Rûnivîsa ev belgeyan divê radestî we bibe.

### Çima temenê min giring e?

Kesên ji 18 salî mezintir, mezinan tên hesibandin. Çawaniya helwesta gel wan kesane ge kesên ku bin 18 sal temenê wan e, "zarok" têne hesibandin û xwedîyê hemû ev mafan e ku di vê belavokê de hatiye şirove kirin.

- ✓ Di piranîya rewşan de, daneyên te yê şexsî li ser ragihandina devkî ya te tên qeydkirin . Di doza hebûna gumanê li ser temenê û / yan netewa te, gengaze bi rêya hevpeyvînê tu werî nirxandin û doktorek ji bo nirxandina temenê te, te biceribîne. Ev mimkun e ku ji te bê xwestin ku ji bo ceribandinê tenduristîyê bêtir, biçin nexweşxaneyê.
- ✓ Daneyên we yên şexsî , li ser esasa vê nirxandinê cem Navenda Xizmetên Nasnameyî û Pêşwaziyê qeyd dibin û di belgeya we de tê cih bigire.
- ✓ Herwisa qet tiştekî îmze neke eger ku naveroka vê fêm nakî.
- ✓ Eger pêwîst be, daxwaza wergerek bike ji bo zimanê xwe.




### Tê min bibene ku?

Ez li kolanên giravên Lesvos / Xiyos / Kos / Leros / Samosê an li ser sînor Orestiada (yan jî cîhekî din) im û ez bi tenê me û temenê min di bin 18 salan da ye. Wê çi bê serê min?

Tu ji bo zanîna kesayetî û qeydkirinê ji Navenda pêşwazî û naskirina kesayetiyê re bê şandin. Pê bidawî hatina vê pêvajoyê, li ser esasa zirarmendiya te, mumikne tu ji bo herêmek ewleh * di kampekê de an jî ji bo starekê bêne veguhestin ku li vir kesên biçûk bê hevrê tên xwedîkirin.

**LI BÎR NEKIN!** Piştî ku tu li cihên jorîn hatî bicih kirin, divê tu navê xwe, temen, netewe û sedemên hatina xwe ji bo Yewnanistanê, bi xwe û bi jîrîtiya xwe ragehînî.

** Herêmên ewle ev cihin ku xizmetên belaş ji bo kesên biçûk di nava kampan de, pêşkêş dike.*

### Paşê tê çi bibe?

- ✓ Xizmetên belaş ji bo dabîn kirina pêdiviyên bingehîn, ji were tê pêşkêş kirin:
- ✓ Pêdiviyên bingehîn: Danên xwarinê, cil, babetên paqijiyê
- ✓ Xizmetên saxlemiyê
- ✓ Piştgiriya derûnî
- ✓ Xizmetên hiqûqî

# § 1. Mafên te



## Niha ez li kû me?

Bi xêr bên bo Yewnanistanê, welatê endam ê Yekîtiya Ewropayê (YE! Paytexta wî welatî Atîna ye û zimanê fermî Yewnanî ye. Ji bo piştgiriya baştir ji bo we, em dixwazin agahiyên kêrdar derbara mafên te li Yûnanistanê bidin te. Yewnanistan, wekî welatê damezirînêrê demokrasiyê û wek afirînerê mafên mirovan, dixwaze we biparêze û piştgirî û alîkariya we bike!
Em ji te daxwaza pere nakin, ji te pere nastînin, û qet hêviyên wisa ji te nakin. Em tenê rêwîtiya bi ewle ji tere dixwazin, û dixwazin têketina we ji Ewropa yê re xêrhatin bêjin.
Ezê bêm binçavkirin?
Ev ku gengaze tu zarokek biçûkên û dûr ji malbat û bi tenê bî, ne sûc e. Radest kirina daxwazê jib o mafê penaberiyê nabe sedemek ji bo binçavkirin ê. Tu ji ber ku te sînor bi qaçaxî bê derbas kirina pêvajoya qanûnî, derbas kiriye, li wirî. Ji bo diyar kirina nasname û qeyd kirinê, divê di xalên ketina nava Yewnanistanê, xwe di navendê pêşwaziyê û naskirina kesayetiyê an Rêveberiya Polîsan bidin naskirin.

## Gelo tê gel min û penaber / koçberên kêmtemen kiryarek cûda tê were kirin?

Hemû kesên kêmtemen bê berçavgirtina kesayetî, cihê lê dijîn, ziman, ola, an regez, xwedî mafên wekhevin.

## Ez dikarim ji mezinan daxwaza alîkariyê bikim?


Divê hemû kesên mezinsal tiştê ku herî baş e ji bo te pêk bîne. Hûn dikarin hertim ji mezinan daxwaza alîkarî û piştgiriyê bikin! Ji bîr neke, nabe k utu pere an tiştekî ji bo mezinan ji bo vê alîkariyê bidî!

- ✓ Ji her kesekî re ku dibêje ji te ve veguheze welatekî Ewropa an dibêje tê ji te re karekî peyda bike, bawer neke, tevî ku ev ji te pere ji nexwaze, xênjî vê gengaze ku bi awayên cuda tu werî xapandin.

- ✓ Ev baştir e ku jiyana xwe ya nû bi rêyên ewle û gavên qanûnî destpê bikî, ne riyên neqanûnî ku tê bibe sedema peşîmaniya te!
- ✓ Her tim balder be ku li gel çi kesekî tu diaxivî, bizanin ku ji bo kê dixebite, û navên wan binivîsin. Eger tu ji parêzerek şêwirdariyê distînî, her tim wî/wê daxwaz bikin ku karta xwe û hûrgiliyên têkiliya xwe ya nivîskî nîşan bide.
- ✓ Hertim hewl bidin ku agahiyên biroj bi rêya têkiliya li gel rêxistinan an berpirsên din ên parastina zarokan, ku ji bo alîkarîya we li vir in, bidest bînin.
- ✓ Tenê ji ber ku ew kesene hevwelatiyê we ne, baweriya xwe ji wan neyine. Giş kes di rewşeke dijwar de ye û hemû kesê li dora we, mirovek baş û dilsoz nîne.

Xebata xwe berdewam bike!

## Ez dikarim bi malbat xwe re têkiliyê bigirim?



Eger tu li gel dê û bavê xwe an jî xizmên xwe nînî, dî, ev mafê te ye ku bi wan re bimînî. Ev tê wê wateyê ku eger dê û bavê te li welatekî din da bin, mafê te heye ku gel wan pêwendiyê bigirî û daxwaza gihiştina dubare ji malbata xwe re pêşkêş bikî.

**LI BÎR NEKIN!** Standina alîkariya hiqûqî û an parêzvaniya biçûk, mafê herî bingehîn ê te ye.

- ✓ Eger tu li nêzîk li temenê 18 salî da yî û dixwazî daxwaza gihiştina dubare ji malbata xwe re pêşkêş bikî, divê tu ecele bikî û li berî rojbûna xwe, doza xwe bi başî qeyd bikî.
- ✓ Eger temenê te di bin 15 salan da ye û kesek li gel te nine, nûnerekî qanûnî ji te re wezîfedarkirin ji bo pêşkêşkirina daxwaza mafê penaberiyê li ser navê te!
- ✓ JI ber k utu kesekî gelekî biçûk ê bêhevrê ne RIC / Dozgerê Giştî / serpereştiya berpirsiya doza te liser mile xwe dgire

## Kê xwedî mafên zarokatiyê ne?

"Maf" her zarokî ku tu jî di nav de ye, şamil dibe. Eger temenê te di bin 18 salan da be, tevî ku dê û bav an jî xizmên te li gel te bin an ne, tu biçûk tê hesibandin. Di Ewropa yê de hemû zarok xwedî mafên wekhevin, ku wekhev baldarin.

## Mafên min çi ne?

Li Yewnanistanê û li giş Ewropa yê, hemû zarok û kesên kêmsal û kêmtemen xwedî mafê mirovan e ku di Peymana Neteweyên Yekbûyî li ser Mafên Zarokan (CRC NY) de hatiye tomar kirin.
Li vir tu dikarî mafên herî girîng bibînî:

1. **Mafê-cûdahî nexistin**: Hemû zarok bê berçav girtina kesayetî, cihê ku ew lê dijîn, karê dê û bavê xwe, zimanê, ola, ka regez, çand, seqetî an dewlemendî, xwedî mafên taybet bi xwe ne. Nabe ti zarokek bi t sedemekê bikeve ber kiryara cudakariyê an kiryara nedad.
2. **Berjewendiyên zarok:** Hemû kesên mezinsal divê tiştê ku ji bo te herî baş e, pêk bînin. Divê dema ku mezinan biryaran digirin, li ser vê bifikirin ka biryara wan çi bandorê dêxe liser zarokan.
3. **Jîyan, geşbûb û parastin:** Divê rayedarên hemû welatan we û hemû zarokan biparêzin û ji bo pêşveçûna tam di warê fîzîkî, derûnî, exlaqî û civakî de alikariya we bikin we,
4. **Beşdarbûn:** Te û hemû zarokan maf heye ku gotinên xwe li ser biryarên ku bandorê dêxin ser we, bêjin û we ev maf heye ku nerînên we di her warî de li ber çav bên girtin.

**LI BÎR NEKIN!** Hemû mafên li jor ku piştgiriya berjiwendiyên e dike, li Yûnanistanê tê sepandin. Herwisa ti biryarek u bandore bêxe ser we bê agadarî û rizamendiya we nayê girtin!

## Ez dikarim nêrîna xwe bêjim?

Mafê te heye ku nêrînê xwe pêşkêş bikî û kesên mezinan divê guhdariya we bikin û vê cidî bigirin. Te mafê wergêrra bi zimanê zikmakî yê xwe heye.




## Gelo mumkine ku kesek ji min re ziyanê bike an jî gel min kiryarek xirab bike?

Mafê te heye ku tu li ziyanê û kiryarek xirab hem liser leş û hem jî derûna xwe dur bin. Eger ev yeke biqewime, herdem gel mezinsalek pêbawer biaxive.

## Ez dikarim herim bijîşk, eger ez nexweş bikevim?

Mafê te heye ku ya herî baş ya tenduristiyê tune lênêrîna gengaz, ava ewle ji bo vexwarinê, xwarin bijartîn, a paqij û bi ewle, û agahî ji bo alikarîya we baş be.

## Ez dikarim biçim dibistanê?



Perwerde Li Yûnanistanê, ji bo zarokên di bin 15, salan de, di dibistanên fermî de mecbûrî ye. Ji bo te, û gelo ka tê bikarî bici perwerdehiyê an na(bi fermî an nefermî) girêdayî şert û mercên li jêr e:

- ✓ rewş (hebûna hevrê, bêhevrê / veqetandî)
- ✓ temen (di bin 15 salan, ser 15 salan)
- ✓ destûrên pêdivî (razîbûna serpereşt / razîbûna dê û bavan)

## Ez dikarim kar bikim?

Dewleta Yûnanistanê te diparêze, ewlekariya we dabîn dike û pêdiviyên bingehîn ên we (xwarin, cilên, û sitar) pêşkêş dike, ji ber vê kar kirina we ne pêdiviyê. Lê helbet, eger tu dixwazî kar bikî, ji kesê parêzer an serpereştê xwe daxwaz bike daku di derbareya derfetên pîşeyî, şiretan ji were pêşkêş bike.

## Gelo hînbûna zimanê Yûnanistanê mecbûriye?

Yek ji mafên bingehîn yên mirovan mafê bikaranîna çanda, ziman û ola kesî bi xwe ye ... ji ber vê hû nemecbûrin ku zimanê Yûnanistanê hîn bibin. Di rastiyê de, di dema mana te li Yewnanistanê, wergêr di hemû kar û baran de tê alîkariya we bikin. Helbet ji we tê pêşniyar kirin ku ji bo ku jiyana rojane hêsantir be, bi çûna dibistanê an derbas kirina nimûneyên din ên perwerdeyê zimanê Yewnanistanê hîn bibin.



# 2. Divê ez rêzê ji çi qanûna bigirim? Berpirsyariyên te

Di UN CRC da hinek ji qanûnên ku divê hûn rêzdar bin, hatine amaje pê kirin, bi taybetî jî ev e ku divê hûn rêzê ji mafên kesên din bigirin.

- ! Ji ber ku tu, bê berçav girtina regez, esla etnîkî, ziman, temen, netewahî an ola xwe xwedî hinek mafa yî, divê hûn rêzê ji mafên kesên din jî bigirin.
- ! Ji ber ku mafê parastinbûn li hember zilmê, mêtîngerî û îhmalkirina ji bo te parastiye, divê zirarê negehînin kesê din.
- ! Ji ber ku tu mafê hebûna jîngehek paqij , ji bo te parastiye, divê tu jî jîngeha xwe paqij xwedî bikî.
- ! Ji ber ku te mafê perwerdekirinê heye, bes divê tu rêz ji qaîdeyên sîstema perwerdeya Yewnanistanê bigirî.

Herwisa, divê tu rêz li qanûnên wî welatî bigirî. Ji bo nimûne li Yûnanistanê, alkol, tiryak û tûtinê ji bo kesên bin temenê 18 salî qedexe ye. Herwisa, kirinên wekî dizî, qehbetî an karê neqanûnî ji bo hemû kesekan qedexe ye. **Nabe tu ji bo gehîştina bo welatê meqseda xwe, bixebitî ku bi rêyên nezagonî, pere qazanc bikî.** . Eger tu wisa bikî, hûnê bikevin ber xetereyê. Dewletê Yewnanistanê dê alîkarîya we bike, da ku bê pirsgirêk pêdiviyên we dabîn bibin û hûn bigehin armancên xwe!

**LI BÎR NEKIN!** Tu hertim dikarî agahiyên ku hûn hest dikin hesas, şermîn, û nezagonî ne, an jî dibe ku hûn bikevin rîskê, ji me re ragehînin! Em we piştrast dikin ku ev agahiyane tê tev nehênî bimînin û, lê ya herî girîng jî eve ku emê alîkariya te bikin û û te biparêzin! Em baştirîn berjewendiyên we , ku di nav de daxwaza ji bo parastina navnetewî ji cih digire, berçav digirin.

# 3. Xizmetên heyî

## Ez bi xwe tenê divê hemû prosedurên derbas bikim?

Ji ber ku tu di bin 18 salan dayî û hevrêyê te tune an ji hev cuda ketine, dewleta Yewnanistanê tê nûnerekî qanûnî, ji bo alîkarîya te ji bo bidestxistina destûra dozgerê giştî yê kesê biçûk, didamezirîne. Tu dikarî ji wî/wê liser ev civînê û herwisa civata hevpeyvîna xwe, rabêja zagonî bixwazî. Bêntenga nebin, ev pêvajoye hinekî mumkine direj bibe!

## Eger ji bo şopandina doza xwe pêwîstiya min bi parêzer hebe, divê ez çi bikim?

Mafê te heye li seranserê mana xwe li Yewnanistanê ji bo piştgiriya xwe, parêzerek te hebe. Dikarî bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivî, û wergêr alîkarîya we bike.

## Eger pêwîstiya min ji bo şêwirê an axavtina gel kesek pêbawer hebe, divê ez çi bikim?

Tu dikarî gel yek ji berpirsên parastina zarokan , li cihê ku hûn dimînin, biaxivin û ev dikare alîkarîya we bike û we li bi kêrhatî rahênan bike.
Di dema neçariyê da herwisa hûn dikarin gel jêderên jêr tikilîyê bigirin



- Hêla Neteweyî ji bo parastina zarokan. Telefon: 1107
- Hêla SOS Neteweyî ji bo zarokan. Telefon: 1056
- Hêla piştgiriya ji bo zarok û nûciwanan. Telefon: 116 111
- Xaça Sor a Yewnanistanê. Telefon: 210 5240440
- Ofîsa cîgirê lêpirsê Mafên Zarokan . Telefon: 800 11 32 000